







ANE - Çêklîst: wateya nûnertiya dayîkbavan li navendên muqateya-rojane û dibistanan çi ye?

Gelo hûn hez dikin piştrast bin mercên zaroka we li muqateya-rojane û dibistanê baş e? Piştre – wekî nûnerê dayîkbav beşdar bibin. Bi vî awayî hûn dikarin baştir piştevaniya zaroka xwe bikin. Me hin zanyarî ser wateya rola „nûnertiya dayîkbavan“ bo we amade kirine.


WATEYA BEŞDARBÛNA DAYÎKBAVAN ÇI YE?

-  **Hûn dikarin li pêvajoya biryardayîne de beşdar bibin**
Hûn wekî dayîkbav dikarin li bernameyên dibistanê û muqateya-rojane beşdar bibin, xwe agahdar bikin û beşdar bibin. Ev di Qanûna Dibistanan a Berlîne û Qanûna Xurtkirina Muqateya Rojane ya Zarokan de hatiye gotin.
-  **Hûn dikarin beşdariya çalak bikin**
Hûn dikarin wekî nûnerê dayîkbav (nûnerê dayîkbavan) werin hilbijartin.



EGER EZ BEŞDAR BIBIM BO MALBATA ME ÇI TÊ DE HEYE?

-  **Ew rewşeke baştir amade dikin**
Hûn arîkar dibin mercên li muqateya-rojane yan dibistana zaroka we baştir dibin.
-  **Hûn mamoste, perwerdekar û dayîkbavan nas dikin**
Eger pêdiviya we bi nîqaşê hebe hûn ê bizanin bi kê re pêwendiyê çêbikin.
Hûn dayîkbavên din nas dikin. Hûn dikarin bi dayîkbavên ku ji zû ve li vir dijîn yan li muqateya-rojane yan dibistanê zarokên wan ên mezintir hene danûstandinê bikin.

EZ ÇAWAN DIBIM NÛNERÊ DAYÎKBAVAN?

-  **Hilbijartina nûnerên dayîkbavan**
Her dayîkbav û her serperestê qanûnî dikare bibe nûnerê dayîkbavan a klasê yan koma muqateya-rojane ya zaroka xwe.
Hilbijartina nûnerên dayîkbavan li yekemîn civîna êvarê ya dayîkbavan li muqateya rojane yan sala dibistanê tê lidarxistin.
Du nûnerên beramber ên dayîkbavan tên hilbijartin. Bi vî awayî hûn dikarin kar nava xwe de dabeş bikin.

BERPIRSYARIYÊN MIN WEKÎ NÛNERÊ DAYÎKBAVAN ÇI NE?

-  **Nûnertiya berjewendiyên**
Hûn wekî nûnerê dayîkbavan nûnertiya berjewendiyên zarokan dikin û erka we ya navbeynkariyê nava dayîkbavan, mamosteyan û perwerdekarên heye.
-  **Pêwendiya bi kesan re û biparvekirina zanyariyan**
Ew kesên çêkirina pêwendiyê bo mamoste û perwerdekarên klasê yan komê ne. Hûn zanyariyan digihînin dayîkbavên din.
Wexta ku negîranî yan pirsên dayîkbavan hebin ew kesên bi wan re pêwendiyê çêdikin. Ew ser mijarên ku têkildarî hemû klasê yan komê ne bi rêberê komê yan mamosteyanê lêveger re nîqaş dikin.



Zanyariyên ser mafên dayîkbavan

Hûn ser mafên dayîkbavan agahdar dibin û zanyariyên xwe bi dayîkbavên din re bi par ve dikin.



Civînên dayîkbavan ên êvaran

Civînên dayîkbavan ên êvaran baştirîn derfet in bo dayîkbavan ku pirsan bikin û ser wan mijaran nîqaş bikin ku bo wan girîng in.

Li Kîta'yê: Mamoste rêxistina civînên dayîkbavan ên êvarê dikin.

Li dibistanê: Hûn wekî nûnerê dayîkbavan wan dayîkbavan hemahema sê caran li sala xwendinê de vedixwînin civînên êvarê yê dayîkbavan. Hûn bi şewirmendiya rêveberê klasê van civînan li dar dixin.



Çêkirina Torreke Dayîkbavan

Hûn wekî nûnerê dayîkbavan piştrast dibin ku dayîkbav bi hev re têkiliya wan heye.

Hûrgiliyên pêwendiya xwe bi par ve bikin yan listeyeke pêwendiyên çêbikin.

Hûn dikarin civîneke dayîkbavan yan mêvaniyeke klasê li dar bixin ku her kes bikare hevdu baştir nas bike.



Li asta hemû dibistanê yan Kîta danûstandinê bikin

Li Kîta'yê: li Kîta'yên mezin de hûn li komîteya dayîkbavan (EA) beşdar dibin, ku nûnerên dayîkbavan ên hemû koman tê de hene.

Li dibistanê: Hûn wekî nûnerê dibistanê li Civîna Giştî ya Dayîkbavan (GEV) beşdar dibin ku nûnerên dayîkbavan ji hemû klasan û birêveberiya dibistanê tê de amade ne.



Komîteya Kîta'yê û Konferansa Dibistanê

Li Kîta'yê: Hûn dikarin wekî endameke EA li komîteya Kîta'yê werin hilbijartin.

Li dibistanê: Hûn wekî endamekî GEV dikarin bo konferansa dibistanê werin hilbijartin.

Komîteya Kîta'yê û Konferansa Dibistanê ew komîte ne ku nûnerên dayîkbavan û nûnerên dezgeha perwerdeyê bi hevbeşî ser mijarên wekî têgeh û dirav nîqaş dikin û bi hev re dirav dikin.



Beşdarbûna şewirmendiyê

Hûn wekî endamekî GEV dikarin wekî endamekî bi dengê şewirmendiyê bo komîteyên din werin hilbijartin: Konferansa Mamosteyan, Konferansên Taybet, Konseya Xwendekaran.

ÇAWAN DIKARIM LI ASTEKE JORTIR DE BEŞDAR BIBIM?



Beşdarbûna li komîteyan li asta devera bajêr

Kîta: EA dikare we bo BEAK (Bezirkselfternausschuss Kîta) hilbijêre.

Dibistan: GEV dikare we bo BEA (Komîteya Dayîkbavan a Deverê) hilbijêre.



Beşdarbûna li komîteyan li asta Eyaleta Federal a Berlînê

BEAK yan BEA dikarin we bo LEAK (Landeselfternausschuss Kîta) yan LEA (Landeselfternausschuss) hilbijêrin.

Herausgeber



Arbeitskreis
Neue Erziehung e.V.
Großbeerenstr. 184
12277 Berlin
ane@ane.de

www.ane.de
www.schueltern.berlin

Gefördert durch



Spendenkonto

Bank für Sozialwirtschaft
IBAN: DE33 1002 0500 0003 2963 02
BIC: BFSWDE33BER
Kennwort: Spende

Gestaltung
Yesser Afghani

© ANE 2021

